Dr Nûredîn Zaza
1919 - 1988

NEWROZ

Osman Sebrî
1905 - 1993

Xebat ji bo : * Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.
* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.
* Mafên gelê Kurd yên netewî di çarçewa yekîtiya wel[êt de .

Ji *weşanên Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê ~ YEKÎTÎ*
Email : Newroz95@hotmail.com

Hejmar(75) Êlûn 2007 z~2619 k Buha (15) p.s

Xebatkar Edîb Îbrahîm ji nav me bar kir

Ne tenê dilê me, belê dilê her dost û hevalên ku mamoste nas dikir bi nûçeya koçbarkirina wî ya dawiyê xemgîn bû.∗Edîb Îbrahîm.

Nemir Edîb Îbrahîm, ku hîn ji biçûktiya xwe de bi doza gelê xwe yê kurd, bi Kurdayetiyê mijûl bûbû û ta roja koçbarkirina xwe ya dawiyê hevalekî jîr û dilsoz ya tevger û partiya xwe ma bû, ne tenê hevalekî partiya me, Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê bû. Ew bi helwest û xebata xwe hevalê hemû partiyên kurd bû, hevalê tevgera kurd bû. Ew berî hertiştî kurdparêz bû – kurdayetî li ba wî hertim di ser hertiştekî din re bû. Ev jî rastiyek e. Lewre tevî zor û dijwariyên nexweşiya xwe ya giran wî tu rojan sistî û lawazî ne xistibû kar û xebata xwe. Tersî wê ew hertim hevalkî jîr û çalak bû – çi li welêt û çi li biyaniyê. Di axaftinên xwe de, ne tenê bi hevalên xwe re, hertim babet û mijara wî derd, vîn, daxwaz û armancên gelê kurd bû; kurdayetî bû kurdayetî, ne ti tiştekî din. Lewma jî gava ew gelek nexweş ket û nema dikarî karê rêxistinî bike, hevalên wî di konfiransa 5-ê ya Rêxistina Ewropa de (04/2004) ew dîsan jî weke hevalekî Komîteya Serkirdayetiya Rêxistina Ewropa hilbijartin. Her weha ji ber pêgirî û dilsoziya wî bi bernema û tozika partiyê re û girtina berjewendiyên gelê kurd di ser hertiştekî din re konfiransa Rêxistina Ewropa (Gulana 2006-ê) biryara xelatkirina wî girt. Li ber ronahiya wê biryarê jî Komîteya Serkirdayetiya Rêxistina Ewropa xelata partiyê ya zêrîn pêşkêşî rehmetî kir.

Xebatkarên ku partîtî li ba wan tenê alav û kurdayetî armanc be, helbet, kî dibin bila bibin, herdem di dilê gelê xwe de dimînin. Ew namirin. Xwedîderketina li wan hemûyan jî tenê bi riyekê dibe: bi kokirina partîtiyê û bilindkirina ala **D.R(7)**